**Ev hersê cure kîvark xwedî kumikên bi deq in. Lê belê ew deq dikarin bi hêsanî dakevin û bes hindek deqên kêm bimînin yan jî qet nemînin.**



### Kîvarkê Mêşan
*Amanita muscaria*

Kumik 10-25 cm ye. Rengê kumikê ji soreka vekirî heta soreka porteqalî ya çilmisî diguhere. Deqên wî spî ne. Li dora dûvikan bazinekî mezin heye û aliyê jêrîn ê dûvikî werimî ye. Di daristanên asayî û yên qaçî da çêdibe.



### Kîvarkê Mêşan ê Qehweyî
*Amanita regalis*

Kumikê wî yê ji qehweyî heta qehweyiya zerdî 10-20 cm ye û xwedî deqên spî yên zerdî ye. Li dora dûvikan bazinekî diyar heye û aliyê binî yê dûvikî werimî ye. Li daristanên qaçî çêdibe.



### Kîvarkê Panter
*Amanita pantherina*

Kumikê wî 5-12 cm ye û xwedî rengên qehweyî ye. Deqên wî spî ne û li dora dûvikê wî herdem bazinek nîne. Aliyê binî yê dûvikî werimî ye. Li daristanên asayî û li parkan çêdibe, carna jî li daristanên qaçî da çêdibe.

### Kartêkirin û nîşaneyên jahrê

Di tevahîya van kîvarkan da jahr heye ku pergala demaran têkdide. Gêjîtî, şaşbûn, diltengî, kêmbûna asta zanebûnê û kramp dikarin derkevin holê. Carna jî xwe nexweş hest kirin û vereşandin çêdibe.

### Hûn dê çawa pêzanîneka zêdetir di derbarê kîvarkan da peyda bikin?

- Tevlî kursekî yan geştekî kîvarkan bibin. Dezgehên perwerdeyî û komeleyên kîvarkan kurs û geştan pêşkêş dikin.
- Malperên kêrhatî: www.svampkonsulent.se
  www.svampguiden.com

Wêne & Neqşe: Michael Krikorev

Ev broşur hatiye nivîsandin ji aliyê Navenda Pêzanînên Jahrê ya Swêdê bi hevkariya Komeleya Şewirkariya Kîvarkan ya Swêdê

Svampkonsulenternas Riksförbund

# Kîvarkên herî jahrîn li Swêdê!



## Raweste!

- Kîvarkên ku dişibin yên di vê belavokê da hatine diyar kirin, kom nekin!
- Bi tenê kîvarkên ku hûn nas dikin kom bikin!
- Wan tam nekin! Heta tama kîvarkên jahrîn jî baş e!
- Bila kesên gehiştî yên bi zanyariya kîvarkan wan pak bikin!
- Ji xwe re pirtûkeka modern a ser kîvarkan peyda bikin!

**Di rewşeka jahrbûneka acîl da telefon bikin bo 112 (24-saetan vekirî ye) û daxwaza Pêzanînên Jahrbûnê bikin.**
**Di rewşên kêmtir acîl da telefon bikin bo 010-456 6700.**
**www.gic.se**



## Ferîşteya Wêranker

*Amanita virosa*

Ev kîvark bi tevayî spî ye. Kumik 5-12 cm ye. Bi asayî li dora dûvikê wî bazinek heye, lê carna jî bê bazin e. Dema hêj gelek teze bin, ew wek hêkekî xuya dikin. Aliyê binî yê dûvikî, ku bi asayî di kurahiya qewzê da rûniştiye, werimî ye. Ferîşteya Wêranker di daristanên qaçê yên kevzî da û li spîndaran çêdibe.

**Kartêkirin û nîşaneyên jahrê**

Jahrê wî kezebê xera dike. Di nav nîşaneyên jahrbûnê da, zikçûn, xwe nexweş hest kirin û vereşandin hene ku piştî gelek saetan piştî xwarina kîvarkan dest pê dikin. Dikare zirareka cidî bide kezebê. Jahrbûn dikare kujek be.



## Kumika Mirinê

*Amanita phalloides*

Kumika wî 5-12 cm ye. Rengê kumikê dikare gelek biguhere di navbera spiyeka tevayî heta kesk û rengên qehweyî yên vekirî da. Binên kumikê spî ne. Li dora dûvikê bazinekî zirav heye, lê belê ne herdem. Aliyê binî yê dûvikî werimî ye. Kumika Mirinê li daristanên asayî, li daristanên têkel (cihê ku darên asayî û yên qaçê pêkve çêdibin) û li mêrgên bi spîndar, mazî û bindeq çêdibe.

**Kartêkirin û nîşaneyên jahrê**

Têda heman jahr heye wekî li Ferîşteya Wêranker. Nîşane jî eynî ne û qasî wî kujek e – binêre li jor!



## Tevnkumika Mirinê

*Cortinarius rubellus (C. speciosissimus)*

Kumik 4-8 cm ye. Kîvark bi tevayî bi qehweyiya sorî heta qehweyiyeka zerdî ye. Kumik bi asayî qoçî ye, lê belê ne herdem. daristanên qaçê yên kevzî yan li spîndaran çêdibe. Kîvarkê Tevnkumika Ehmeqan *(C. orellanus)* cureyeka wekhev e ku têda heman jahr heye. Ew li daristanên asayî yên bi mazî, spîndar û bindeq da çêdibe.

**Kartêkirin û nîşaneyên jahrê**

Jahr gûrçikan xera dike û dikare wan bi tevayî têkbide. Nîşaneyên jahrbûnê heta çend rojên piştî xwarina kîvarkê dernakevin holê. Di nav nîşaneyan da tîbûn, êşa masulkeyan, zêdebûn yan kêmbûna çendeya mîzê hene. Jahrbûn dikare bibe egerê çareserkirineka diyalîzê ya demdirêj û di hindek rewşan da jî dibe ku transplantasyoneka gûrçikî pêwîst bike.



## Kîvarkê Zir

*Gyromitra esculenta*

Kîvarkê Zir bi tevayî girêdayî grubeka cuda ya kîvarkan e. Kumika wî 4-12 cm ye, rengê wî qehweyî ye û di şiklê mêjî da ye. Rengê dûvikên wan diguherin ji gewreka vekirî heta qehweyî yan jî rengên binefşî yên çilmisî. Kîvarkê Zir li biharê, ji heyva Nîsanê heta derketina pelên dara heyzeranê, bi asayî li keviyên rêyên daristanan, li nêzîkê qurmên rakirî yên daran yan jî li daristanên ku hatine birîn çêdibe.

**Kartêkirin û nîşaneyên jahrê**

Jahrê wî pergala demaran têkdide û herweha dikare zirarê bide hucreyên xwînê û kezebê jî. Di nav nîşaneyan da gêjbûn, dupatbûna dîtinê û şelîbûna axaftinê hene. Herweha dibe ku nîşaneyên wek xwe nexweş hest kirin û êşa zikî jî diyar bibin.